

Kurteçîrok:

ŞANO YAN ENDAZEKOÇK



Xalid Salih

Paşê ekterekê herî mezin, qehremanê çîroka ezeliye. Her roj koçkek; bibûrin ji devê min derket. Her roj şanoyek ava dikir. Li her kolanê û li her taxê, li her bajarî şano durist dikir.

Şano ya sêkoşe:

Bi rengê kesk şanoyeka sêkoşe durist kir. Kursîkê xwe dana binkê şanoyê û gelê xweştivî hemû serê sê koşeyî re kom kirin.

Ekter li gelî dinêrî û gelî li ekterî dinêrîn.

Şano ya çarkoşe:

- Gelê cemawerê xweştivî! Min ev şanoya Sora çarkoşe ya duristkirî, dibêjim destê min hindavî sere we be.

Binêrin hindavî serê xwe:

Ne çipikeka barana zivistana sar bi ser we de dihê û ne tîşkeka kela havînê ser û çavên we disoje! Ava barana hişk bû. Erd bo biyaban. Xanî tê de bûne kunmişk.

- Paşê yê xweştivî, destên xwe yên nerm û nazik li ser merekê, bihna me teng bû da henasekê hilkêşin. Nexêr, ez nahêlim çî bayên sar û germ bi ser we de bihên.

Şanoya bazneyî:

Ekterê kursîka xwe dana naverasta şanoya zer, cemawer mîna gêjevanekê her li roj zivirîn. Delîveyekê re dengê hat:

Azadî!

Cemawerî bersiv dan.

Azadî.

Dîwar asinine, deng mîna birîsiyê her li roj cixzê zivirî.

Şanoya lakêşe:

Gel binêrin!

Hûn dizanin me bo ev şanoya spî dirist kiriye?

Bersiva wê ya bi sanahî:

Li gel van hêlan mîna tîjkan li beramberî êk berjewendiyên me digehine êk. Werin da bi hev re her êk ji me li ser hêla xwe biçin, we divê bi dirêjî û we divê bi panî.

Her yê diçin û hêj yên diçin û diçin û diçine ve û her dê biçin û...

Şanoyeka nerêkûpêk:

Qehreman li ser vê şanoya reş kesekê bê xem e. Cemawer hemû têderin.

Pert[kên yasayên di dest wan de û her êk yê bo yê dî dihavêt û ji bilî hera yê çî deng dernakeve. Ji qehremanî ta biçûktirîn kes.